



# mîr Miqdad Paşa Bedirxan

Di 22.4.1898 a de mîr  
Miqdad Paşa Bedirxan bi  
navê  
(Kurdistan)rojnameyek  
deranî, li bajarê Qahîra  
Ev bîranîna yazdemîne  
piştî sed salî ku

**dezgahên ragihandin û çapemenya kurdan bi bîrtîne.**

**Rojname ji hêla deranîn û jimarên wê:**

ev rojname ne rojane bû Her du hefteyan bû. ji çar pelan bû û bi tîpên Erebî û  
şêwezarê kurmancya jorînbû.

**Ji mara yekê Ta jimara pêncan li Qahîrê hate der û jimarên dîtir**

**6-17 :li Cinêfê bi rêvebirya Abduruhman Bedirxan birayê Miqad derhatin.**

**20-23 vegerya Qahîrê**

**24:li Londonê**

**25-29:follston başûrî Londonê**

**30-31: 14/4/1912**

**Dektoe Kemal Fuad jimarên rojnamê tevde dane ser hev û çapkirin ,di binavê  
(Kurdistan, rojnama yekemîn,1898-1912)**

**Li gorî şopandina deranîna jimarê rojnamê û bajarê ku tere derbasdibû ye  
rewşa Miqdad Paşa û rojnama wî bi gewde dike.**

Miqdad nedîtî ji hêla desthilatdarên osmanî ve bi hukmî zindankirina temenê xwe tevdî hate hukumkirin, li gel destdanîna li ser mal û milkê wî yê guhestî û neguhestî, li bajarê Istenbolê. Ji ber çalakyên wî yên siyasî û rojnamegerî ...

Miqdad , bi dilgermî xwe da pirsê rojnamegeryê û rêça pêşî li pêşya rojnamegerya kurdî vekir .

Mijar û manşetên (Kurdistan): di dawaya sedsala 19 dan de û destpêka sedsala 20 an de rojname Kurdistan zimanê derbirîna hizr û armanca netewa kurdan bû. Gotar û mijarêd wê bi zimanekî şêrîn û zelal û bi şêwezarê botanî ji xwendevanê xwe re diweşand. Têkildarî her hêlê jiyana gelê kurd dibû. Bi giştî mijarên ku gelê kurd ber bi ronakbîrî û hişmendîya netewî ve dibir ji xwere hidibijart. Ji bo mafên netewa kurdan rojnamê xwe weke azîne di ragihandina fêrkirin û geşpêdana çanda kurdî berpirsyar didît. Hêjaye gotinêye ku xwesteka kurdan ji bo mafên rewa di şewazî federalyê de cîhê xwe di weşana Kurdistan de girt.

Miqdad paşa di dawya jimara yekê de ku bi zimanê ferensî hatibû weha dibêie. "min ev rojname deraniye û min daye ber çavên xwe aramanca ji bo balkêşî û pêkanîna hezkirinê bixim derûnê lawê netewa xwe, di derbarê fêrkirinê de û derfetên nasîna li ser şaristanya hemdem pêşkêşî gelê xwe bikim, û her weha li ser toreyê wî. li gel ku ez li Misrê me, ez di xwazim sazî û sîstemê li Kurdistan bibînim. Ez tiştêkî ji bo deranîna vê rojnamê naxwazim ji bilî xizmeta berjewendîya gelê xwe û pêşketina asta çandî ji lawê netewa ez jême".

Di wê demê de osmanyên tev lihevî, gir û kîn di nav bera gelan de diçand . rojname (Kurdistan) li dijî rewîştên bedkar bi helwest bû. nemaze ji hêla kurd û Ermenan de bi belgeyî hevjiyana herdû gelan isbat dikir û rêçên aşitî û wek hevî xweşik dikir û penda mîrê mezin weke rêbazekê ji xwere berçav digirt ya di derbarê ol û mezhebamn de weke durşme Mîr Bedrxan weha digot: "ol ya xwedê ye û em tevde birane"

Cîh û derên rojname lê belav dibûn: dera herî ku rojname lê bi nav û deng bû bajarê Şamê bû , ji wir ber bi Kurdistanê ve diçû , Nemaze başûrî Kurdistan tevî ku astengî

,çavdêrî li ser rojnamê bi tundî hebû ,lê dîsa xwe dirêjî destê xwendevanê kurd dikir û kesên pirsra kurdan dişopandin li Urpan bê par nediman.

Mîr Miqdad bi vê pingava xweyî pêwîst qada rojnamegeryê vekir û kevrên wêyî yekemîn danîn ,bi derfetên bi çûk di merc û şertên dijwar de,li dor çardeh salan der bi der li çend cîh û deran li pey deranîna rojnama Kurdistan gerya heya gihan sala1912 an ji vir û şûnde di vê salê de mîr Abdirezaq şopand ,malabata bedirxanya weke çavkaniyek welatparêz û rweşenbîr bi dan û tevger bûn di her hêlê şiyarkirina hişê netewî de.Mîr Celadet di sala 1930 de careke dîtir pirsra rojnamegeryê vejand bi deranîna hewarê û govara ronî. li pey wî Mîr Kamîran Besdirxan sitêr deranî di sala1943 an de .ked û pingava ku bedirxanayn li pey xwe hiştin bû binyad û afrewerî ji bo rojname û govarên ku li pey wan hatin.

Wê rojnama Kurdistan bimîne simbol û maka her rojnama ji bo maf kurdan û erkên mirovatiyê dikoşin .Miqdad bi vê gava wêrek kurd bê par nehiştin ji ragihandin û bersiva gerekên hemdemî, weke gelên dîtir.bi vê gavê jî rojnemevanên kurd bûn xwedan cejn û rojeke taybet.Miqdad wê bimîne cîhê teqdîr û rêzgirtinê û hêjaye ku li navend û derên bi derfet, abide û heykel jêre bêtin danîn û lêkolîn li ser keda wan bibin û jiyana wan bêtir bê ronîkirin.

Çavkanî

-Kovara nûdem jimara 25 an

-sefehata min edeb elkurdî 1954